

SAL 1

HEJMAR 9

—
SÈSEMB

1 KANUNA PÊŞİN 1942

RONAHÎ

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR

ANNEE 1

NUMÉRO 9

—
MARDI

1 DÉCEMBRE 1942



MÊRIK BI ŞAL Ú ŞAP Ú KUM Ú DESTMAL, JINIK JÌ BI XEFTAN
Ú KOFİ BIWA, MËË BIGOTIA EV RESIM BERGEHEK JI BERGEHÊN
KURDISTANE YE. LË JI BER KO MÊRIK BI PANTOR Ú JINIK
BI ÇAKËT E, NE WELË YE. RESIM RËLEKE INGILISTANE YE.



ŞAM—1942
ÇAPXANA SEBATÊ

KER Û HEFT GUR

Li dora gunda kerekfî bê xwedî hebû; pir sepirze bû bû. Ji ber ko heçfî;eki wî heba li wî kerf dikir. Ker ji sixrê xelkê hingî aciz bû bû hemâ ji xwe re bi navsera çiyayî ve hilkişîha. Bi rê de rastfî rovîkfî hatin.

Rovî go: « Ha ker, tê çî kû? » Ker go: « Quzilqurta bavê ker ». Rovî go: « Lî ez bême çî? » Ker go: « Bê ker kurtanî zer, sénfî ceh li ber ». Rovî wilô got û go: « Ma tu min bi xwe re nabî? » Ker go: « Ma çîma ez te nabiim ». Herdû bi hev re çûn; rastfî beranekî hatin.

Berên jî go: « Ha ker tê çî kû? » Ker disa go: « Wilo mebê, bê ker, kurtanî zer, sénfî ceh li ber ». Beran jî wilô go û bi wan re çû.

Bi rê de li dikkekfî rast bûn. Ew jî bi wan re çû. Kfvroskek jî giha wan. Ji xwe re çûn navsera çiyê, mérgeke xwes dîtin û tê de man. Ker jî qelew bû û bitir bû. Ker gote hevalen xwe, go: Gelf hevala, zira min hat, divê ko ez bizarim.

Hevalen wî jê re gotin: Malava tê çawa bîzîri, û em di navsera vî çiyayî de ne. gurin

wê bi me bihesin; dê me hemiwan bixwin.

Ker go: Nabê ileh divê ko ez bîzîrim. Axir kirin ne kirin ker qâfl ne bû. Kerê reş dest bi zirandinê kir.

Heft gur jî nêzîkfî wan hene. Dengê kér kirin. Her heftan ji hev re got: Gelo ev çî deng e tê. Yekfî ji wan go: Ka ezê herim, bê ev çî ye. Hevalen wî go dê here.

Gur rabû, hat dît. Gava ker û hevalen xwe di mérge de ne; bê xwedî û bê xwedan. Hema këfa gur hat û ber bi wan çû; ji cih xwe zer kire gunen kér. Hema kér her dû rehnên xwe li stiwê gur şidandin û beran ji pişt ve rabi-wê bi poşan; dîk çû ser pişta kér bang da; rovî erd kola û kfvroskek da xapa. Bi vî karf berên gur bi po:a nehiş kir.

Pasî gur ji nav lepén wan filîf, lê nîvmîr çû giha hevalen xwe. Hevala jê pîrsî go, bira tê çî dî; go bira qet deng mekin ez çûm min qewmek li wir dîl kes ne binê; go çawan; go çaxê ko ez çûm hema serê min kirine nava du latan û li du mékutan li nav pişta min dan û yekfî ji wan yasin li ser min dixwendin û yekfî dida xapa li kefenê min digerîha û yekfî tirba min dikola.

Hema her heft guran ji cih baz da. Gotin, gidi em ji lepén wan xelas bûne.



JI BİRÊN HICÜMA DIYEPÊ


Gava ingilsîz û hevalbandan di peravê Fransê de dirêjî Diyepê kiri bûn tangên xwe di nav kelekên behîf de guhesti bûn û ew ji Ingilterê an bûn Diyepê, herwekfî klîşa jorfin şanî dide.

8 KİLO

SPİK Ü ZERDIKA HÊKEKÊ

Ne ko me hêkên mezin ne dítine. Ma hêkên qaz û dikên şami hûr in. Paşê di hin malañ de me hêkine fêris ditine; hêkên niaman. Ü gava em wan dibinin li wan heşmetkar diminin û dibêjîn bi qasî serê zarokeki ye an bi qasî 25 hêkên mirışkan e.

Lê welé dixuye, li wextê berê, çaxê ko li dinyayê mirovén bi sê çar métiran dirêj hebûn teyirine welê peyda dibûn ko hêkine bi heşt kiloyan giran dikirin. Ji wan teyran re êpyornis digotin. Her hêka êpyornisan bi qasî 150 hêkên mérişkan û 6 hêkên niaman mezin bû. Di sala 1850t de Adabi, kaptanê vaporekê, di girava Medagaskarê de sisé ji wan hêkan peyda kirin û ew anîn Ewropayê. Zana li wan hûr bûn û gotin ko ev hêkên êpyornis in; ji teyrêñ wextê berê. Reşikên giravê ji wan bi awayine têvel istifade dikirin û ew li şûna den, conî û dizikan istimal dikirin.



JI BOMBAVÊJÎN EMÊRÎKANÎ TİPEKİ NÜ



YEK JI NEXWEŞEREBEYÊN EMÊRÎKANÎ DI SÛRIYÊ DE
mérişkan bi qasî 150 hêkên mérişkan û 6 hêkên niaman mezin bû. Di sala 1850t de
Adabi, kaptanê vaporekê, di girava Medagaskarê de sisé ji wan hêkan peyda kirin û
ew anîn Ewropayê. Zana li wan hûr bûn û gotin ko ev hêkên êpyornis in; ji
teyrêñ wextê berê. Reşikên giravê ji wan bi awayine têvel istifade dikirin û ew
li şûna den, conî û dizikan istimal dikirin.

Zanayan di giravê de
li hestiyêñ wi teyri geriyan,
ew peyda kirin û hestî
li hev siwar kirin û skelêté
wi anîn pê. Skelêt, yanş tevayıya
hestiyêñ teyri şanî
dida ko êpyornis penc û neperûşkine
welê hebûn ko
pê dikarı bû rahêje mirovekî
û wi di nav pencen xwe
de bişidne û bixiniqne.

Vê paşiyê gava eskerên
ingiltzi daketine girava
Medageskarê wan ji yek jî
van hêkan peyda kir.

ZILAMÉ KO XERÎTE PÊ RE BÛ

Motorboteke emérikanî ji Gwadel-kenalê diçû giava Floridayê. Bi der-vavanenê emérikanî re xerîteyek hebü; diviya bû wê bigehînin fermandarê emé-rikani ye Floridayê. Berlopiyoreke japoni motorbota emérikanî bi nê ve bin av kir. Digel vê hindê xerite gihaşte fermandarê Floridayê.

Yeki ji deryavanenô motorbotê ev sefera xeternak bi awayê jêrin gişî kiriye û gotiye:

Wê şevê, piştî şivê heta saet deh û nivan em di qebhexanê de rûnisti bûn. Peyaki emiral hat û banî Blamey kir. Piştî bist deqîqan Blamey vege riya û gote me ko di benderê de motorbotek li hêviya me ye û divêt heta nîvê şevê em xwe kar bikin.

Li nîvê şevê, li benderê em gihane hev. Barti û Madar bi xwe re du şûse wiski û mîrişkeke braşti ani bûn. Mak Roli ji digel kemença xwe hati bû. Te digot qey em di behirê de diçün gestê. Piştî ko em ketine motorbotê sêrcan Blamey ji me re da zanîn ko emê bi wezîfeke mihim biçin Floridayê û diviya bû beriya spêdeyê em bi-gehin e. Ji milê din Blamey xeritak da min û ji min re got; lê qenc guhdar bibe, xerîteke gelekk e mihim e.



DI STOLA İNGİLİZİ DE TOPÊN BALAFIRŞIKEN

Di vê navê de motora me bi rê ket. Sêrcan miroveki geleki xweşcîvet bû; hin bisserhatiyen xwe ji me re qise dikirin. Herçî Mak Roli qala destgirtiya xwe dikir û digot ko dengê wê gelek spehi bû. Ji xwe kemençe bi xwe re ani bû da ko ji me re stranen ko destgirtiya wê ji wan hez dikir bilehize. Bi rasti ji Mak dest bi lehistinê kir. Di vê navê de Mak strana hêvê ji ji me re strand: Hay lo dilo hêveke çardeşavî li me hilat Hej zava ne kete gerdekî; serê japonan

[bi ser de hat]

Wiskiyê serê me hemiyan germ kiri bû. Em tev de rabûn reqisê û mideki xweş reqisin. Saet ji bû bû dido kêm çarkî.

Didevanê me, ji nişkekê ve terka nêregaha xwe da û li me vege riya. Didevan dida zanîn ko cenkeştiyekê daye pey me û heta sé milan ntzingl li me kiriye. Sêrcan emir da makînist ko hêj bêtir bilezine. Mak Roli da kemença xwe. Me tev de arşkariya wi dikir û disstrand. Didevan disan



TOFEKE ELFMANÎ DI DESTÊN FRENSIZÎNA AZA DÉ

li me vegeriya û got ko bertopiyora japoni ji wxe lezandiye û her li pey me ye. Édi xuya dikir ko dile dijmin heye li me xine. Sércan digot, ji Floridé re şes kilométir maye, li xerite guhadar bibrin.

Em ji hev belav bûn. Min dikir ez herim ser mitralyozé. Sércan got; divêt tu xwe biparézi, xerite bi te re ye. Ez jê geriyam. Mak Roli kete ber tiñña timatik. Héj çend deqlqe ne keti bûn navé ko bertopiyora japoni bera me da. Motora me bi hejek xurt hejiba, lê ji réveçnûne kêm ne kir.

Sércan digot: « Dê heyran dê ji Floridé re pênc kilométir mane ». Sércan héj gotina xwe ne qedandi bû ko guleke din li paşıya motoré ket. Em di nav dû û dûmané de ma bûn. Pişti ko dûman belay bû min li dora xwe



DI KÜÇEYÉN LONDRE DE ESKERÉN HINDI

nihert. Mak Roli di xwîna xwe de vedigevizî. Lé tu tîst bi kemença wi ne hati bû.

Motora me careke din heiha. Min bala xwe da sércan ji keti bû erde, dikir ko rabe lê nema dikari bû. Di vê navé de min dengê dîdevan kir. Didévan digot: keptan miriye, bila yek ji we hête sunê; Floridé re dû kilométir mane.

Guleke nû li orta motoré ket û dilê min ji bîr ve çû û nema ez bi xwe hesiyam. Bi tenê hewqas dihate bira min ko min destê xwe li xerite sidandi bû.


Gava min çavén xwe vekirin, min di dora xwe de mirovén biyani dîtin. Lé tavil min zant ko ew hemşehriyên min in, emêrlkanî ne. Min ji hemşehriyên xwe pîrsi: « Kani Sércan Blamey? » Ewan li hevûdin mihert û meziné wan gote min, « Motora we ji Floridé bi dû kilométir dûr bin av bûye. Bertopiyoreke me çû bû hawara we. Gava ew gîhâste motoré ji te pêve tukes peyda ne kir. Hevalen te, lu xwes... »

Xerite hate bira min. Ez rabûm ser xwe û ez lê geriyam. Xerite ne bi min re bû. Disan min ji wan pîrst: Ka xerite?

Meziné wan li min vegerand û got: Xerite gîhaye desten kumandan û kumandan ji himeta te gelek razi ye.

Ez bi xelasa xwe herçend şa dibûm ewçend ji li ber windabûna hevalen canecan diketim. Strana Mak Roli héj di guhén min de deng dida:

Hay lo dilo héveke çardeşevî li me hilat Héj zava ne kete gerdeké şeré japonan bi ser de hat.



LI LONDRE BEXÇEYÉN SEBZAN DI CAMEKANAN DE

FAS Û TÙNIS Û CEZAÎR

Herweki xwendevanén me dizanin li 8ê Çiriya-pêşin eskerên emérikanî û piştre eskerên ingilizî dakterine Fas û Cezairê û di Tùnisê re berê xwe dane Trablisxerbê. Bi vê hêncetê me dil kir em xwendevanén xwe li ser hin tişlén wan welatan serwext bikin.

CEZAÎR — Ev welatê ha ne mistemeke ne ji welateki binhimaye ye. Cezair di kişwerê Fransê de ji erdên welêt tête hesêb; wek yekê ji wilayetén Fransê ên


ewropayı. Ji xwe beriya şer di parlemana frensizi de heft nîminendeyên Cezairê habûn; wek nîminendeyên frensiz.

Rûyê erdê Cezairê 847 500 kilometir çargoşe ye. Nifûsa wê 6237432 rûnişti-man in. Aljê merkeza hikûmetê ye. Li Aljê wali rûdine û cimhûriyeta Fransê dinimine. Ji ber ko Cezair wilayeteke frensizi têle hesêb, xizmeta eskeri té de mecbûri ye. Di ordiwa Fransê de siwarêni Cezairê bi zinê xwe ên bi kewkeb bi nav û deng in Frenziz ji wan siwarêni re « sipahi » dibêjin.

Di peravên Cezairê de deştine hê-pivan hene. Di wan deştan de her texlit zad û rezin çedibin. Li aliyê bakurê welêt rûl û daristan zehf in. Hatinê welêt nemaze genim, ceh, garis, kartol, titin, hevrîsim û kêndir in. Ji milê din darêni fekiyan té de zehf in: xurme, hinar, moz, sêv, hejîr.

Çaryeka rûyê erdê Cezairê daristan e. Ji lewre texte û keresteyê Cezairê ji gelek e.

TÙNIS — Tùnis di bin himayeta Fransê de ye. Li Tùnisê begek heye. Ev beg hakimê welêt tête hesêb. Lê iş bi waliyê frensizi diqede. Pêşiyên begên Tùnisê ji girava Girtêté hatine û ji mala wan re mala Mihemmedê Eli Meznûn dibêjin. Di sala 1881ê de gava frensizan Tùnis vegirt û ew



kire bin himayeta
xwe, beg weke berê
ê de hiştin.

Rûyê erdê Tûnisê 48000 mil cargoşe ye û nifûsa wê digehe 3608315 rûniştiman-an. Li Tûnisê ji ereb û bedewiyân pêve zehf cihi hene. Ji xelkêن Ewropayê ji frensiz û talyan hene; nemaze talyan zehf in. Li Tûnisê ji wek cezairê xizmeta es-kerî mecbûri ye.

Bakurê Tûnisê ciyan e. Li aliyê rohelê deştin hene û erdê wi bi kêri cotkariyê Zeytûn zehf in; pez û dewarên wê ji boş in. Herçî aliyê ntvro erdeki sehrawî ye û tê de xurmeyine qenc çedibin.

Xelkê Tûnisê di tevinê de ji xurt in. Qimaşine hiri û hevrişim çedikin.



DI KENALA MANÇESTERÊ DE VAPOREKE RËWINGIYAN
Sinheta debaşetê ji pêş ve çûye. Xêra ferensizan hîni çekirina şerabê ji bûne û jê şerabine bijarte dertên.

FAS — Ji vi welati re Merakîş ji dibêjin. Ji sala 1912an ve Fas di bin himayeta Frense de ye. Birekti vi welati di destêن spanyolan de ye. Herçî erdê frensizi 213350mlf cargoşe ye. Nifûsa wê 5874 888 rûniştiman in.

Li Merakîş erdêñ daristan zehf in û jê tex-teyine qenc çedibin. Ji milê din xelkê wi welatt hespine hêja bi xwedî dikin û hespêñ wan zehf in. Hatinêñ welêt ceh, genim, garis, zeytûn, mehûj, behîv û fêkine din in. Frensizên van welatan ji 8ê Çiri-ya-paşin ve, şerê elemanan dikin.



PIYADEYÊN RUSI BER BI DIJMIN RABUNE HICUMÊ

BEHIRA-SPİ

DİROKA WÉ Ü ŞEREN
KO TÊ DE ÇEBUNE

Li gora sehkirina zanan û pisporan erdnigarîyê Behira-spi beri 30an 40000 sali, di heyama mirovên dêwendam de erdeki qelaç bû û tê de gol û goltikine hêqeder zehf hebûn û çemîm tê re diberikin û heywanine bejê lê peyda dibûn. Mirovên wê heyamê ên hov, bejina wan bi sê çar mêtiran bilind ewheywan neçirdikirin, goşte wan dixwarin û postûn wan li xwe dikirin û cajina resimên wan rawir û cenawiran li diwarîn şikeftên xwe dineqisandin

Ev gewmén ha hêdi hêdi di şaristaniyê de pêş ve ketin û ji hestîyan ji xwe re nehk çekirin û hîni masivaniyê ji bûn. Bi vi awayt ji bejê berê xwe da bûn avê û jê ji istifade dikirin. Lê insai ê hov ji wek insai ê fro xwazekarê pêşveçnû û bû; wi ji dixwest daira hikimê xwe

ŞER Ü SÜRET




Hitler di sala 1941ê de pişti ko ordiwa elemanan gillaştı bû dora Moskoyê gotarek da bû û tê de goti bû: Ordıwa rûsi ji hev de ketiye nema dikare şerê me bike. Di dawiya sala 1942an de ev ordû hêj şerê elemanan dike û we'e dixuye go vê Zivistanê ji par hêtir ewê elemanan bişinê. Ji xwe li gora nuçeyen paşin ेrişa ürisah ya Zivistanê ji niho de dest pê kiriye.

herçend beye ewçend fireh bike. Ji lewre mirovê dêwendah dixwest avê ji bêxe destênen xwe, li ser wê bisékine û tê re biçe ji. Ji bo vê yekê ji bi qamışen golan perânsûyen hewdeke çekirin, eyarên dehban lê vegirtin û bi vi awayi filûqa pêşin anîn pê û ew daxistin ava golan û dest bi der-yavanyê kirin.

Dissâ li gora texîmina pisporan beri 15 000 sali dévera ko iro jê re Cebeltariq dibejin qelişî û ava behirê dera ko iro jê re Behira-spi dijîn végirt. Bi vi awayi Ewrope, Esriqe, Asye ji hev veqetîyan û herçî çiyayêni wi erdi di vê behirê de giravine ko em fro dibtnin antne pê.

Di peravên Behira-spi de medeniyetine mezîn rabûhe. Gava Hemorabî li Babilê hukim dikir di Sûr û Seydayê de medeniyeta finikian şîn dibû. Medeniyetên Misir, Roma û Yewnanistanê ji dîsan di peravên vê behirê de şîn bûne.

Her weki nasîne, medeniyet bi şerîne şîn dibûn û bi şerîne dîn diqelihîn,



Balafirek ji balafîrên emêrikani yên ko çek û peyân ji qadekê diguhesinin qadeke din. Di vê balafirek de 70 peyâ û du tangên hûr an çar topên navîn cih dibin.

winda dibin. Ji xwe tu dewlet nne ko doza medemiyevê kîriye û ne ketiye şerine no û mezin. Ji lewre di vê behirê û di peravên wê de, ji roja ko insanan kari bû li ser behirê bisekinin û lê derbas bibin, şerine mezin çebûne. Pey hev yewnanan berda eceman, romaniyan berda qertaciyan, ereban berda romaniyan, dewletên ewropayı berda osmaniyâ....

Beriya mîlada İsa pêxembi ber bi pénc sedsalan yani esiran Selâmsî di vê behirê destola Zerkstsê farisi şkénand. Disa di sedsala beriya milada İsa de stola Oktavyos di cihê ko jê re Eksiom dibêjîn, stola Anthonyos perişan kir. Di sala 1831ê de Libyanto di vê behirê de stola tirkan ji hev de xist. Dawî, dawi di Navarin û Ebûqirê de stolên Mihemed Elj û Nepôlône şikestin.

Mideki Behira-spi rahet ma. Di wi midetti de xelkê Ewropayê çavên xwe berda bû Emîrikê. Dewletên ewropayı ên kişwerkise tê de ji xwe re mîstêmlike çedikirin.

Lê piştî ko kenala Swêşê vebû çavên xelkê ji nû ve li vê behirê vegeriyan. Behira-spi ya ko bi têne derik hebû, bi vî awayî bû xudan du deriyan: Swêş û Cebeltariq. Bi Swêşê vapor bêt ko nivroye Efriqiyê an bakurê Ewropayê li xwe badin, xwe digihandin Behira-hindi. Ji dewletên peravîn her yekê digot Behira-spi gola min e. Nemaze İtalya Mûsolînî.

Lê Ingiltera ko ne dewle-teke Behira-spi ye bêt ko bibeje Behira-spi gola min e mifteyên her du deriyên wê ji mêtî ve xistîne bêrika xwe.

Gelo xwediyê xaniki ki ye? Yê ko tê de girîl ye, an yê ko mista xêni pê re ye û bi këfa xwe dikeviyê û jê diçê der.



Xelkê Ingilterê iro hesêb tev de seferber in, ci jin ci mîr. Herkeres li awaki ji midafshe û parastina kişwerê Ingilistanê re dixebebê. Peyavên ko di klîşeyên vi rüpelî de têne ditin bi pirahî xelkê sivil in. Ev peyavên ha bi hin deryavanen resmî re li dora giravên Ingilterê û di bin behirê re têl û toran vedigirin da ko çatîren neyar nikarin i fzingiyê li peravan bî kin



KELEDONYA NÜ

Kelédonya-nü ji giravên Pestfika nîvro ye û dikeve rohelatê Ewistralyayê. Ev girav mistemlekeke frensizî ye û ji ber cihê xwe ê cexraff ehemiyeteke eskerl heye. Kelédonya-nü wek mistemlekeyên frensizî ên din di bin hikimê Vişiyê de bû. Lé bert çend mehan waliyê giravê digel peyayên xwe derbasî aliyê général de Gol bûye. Ji hingê ve stol û balafirêne hevalbendar jê haviline mezin dikan.

Diréjahiya giravê 400 û pehnahiya wê 60 kilometir in. Erdê wê çiya ye û di newalén ko di navbera çiyan re diréj dibin ro û robarin diherikin. Ava wan çeman wek ya goltikên serê çiyan gelek zelal e. Ewçend ko siha dar û deviyên çiayên dorê tê de téne ditin.

Hewa vê giravê dimine hewa Ewropayê; ne gelek germ, ne jt gelek sar. Hatinêن giravê madenine têvel in; wek nikel, krom, hesin û mengenêz. Di giravê de fabrikeyine mezin hene. Di van fabrikan de li salê 10 000 ton nikel û 100 000 ton hesinê krom téne helandin. Ev madeyên ha fro tev de diçin Emérîkayê û pê haceten cengê çedîkin.



BANÛ RÜZWELT

Herweki Mr. Rûzwelt serekimhûrê Emérîkayê ji bo kar-kirina cengê cihanê xebateke zor dixebe-te, jina wi ji li rex mîrê xwe sekiniye û pardariya vê xebatê dike.

Banû Rûzwelt ne bi tenê fro, di wextê ser de, lê berê, di wextê aşiyê de ji xwe ji xebatê bi dûr ne dixist û nemaze di civatên pêşveketina jinan de dixebeit. Lâ piştî kô ser dest pê kir banû Rûzwelt berê xebata xwe ber bi armanca nû badaye.

Rekma emrê xwe û mezin, banû Rûzwelt vê pasiyê ji Emérîkê fîri û hate Londrê û midêki dirêj di payitêxte Ingilistanê de maye û bî diyari qral û miroydewletên Ingilistanê ket. Ma hînen me ji ne wele bûn. Bi ferqa ko yêne me, ji ber ko me fabrike ninin, li şuna ko li fabrikan hûr bibin, diketin pişta hêşpan, rexî û bosatê xwe girêdidan û li rex mîrê xwe serê dijmîn dikirin.

Ne bila sebeb e ko medhelokê gotiye: Şér şér e, ci mî û ci nîr e.



Li Kelédonyayê

bi tenê bajarek heye; bendera Nomyayê. Berê ev bender war-gehê stola frensizî bû. Iro herçî vaporên hevalbendar û balafirêne ayê ne ji vê ben-derê istifade dikan. Xera vê benderê vap-or û balafirêne ko ji Sanfransiskoyê radi-bin, dikarin bi rê ve ard ûyên di vî war-gehî de xwe temam bikin.

Çeliyên Londrê di salo-neke xwarivê de ava fekiyan vedixwin.

NE KÜSTİ

NE JÌ BIRİNDAR, LÉ DI NAV MİRİYAN DE

Di şerê Misir û Libyayê de mişderê hêstîn talyani yên ko ketine destêن ingilizan bê hed û hisab in; herhal ew ji qûm û kevirên sehayê bi geleki bêtir in. Ji destpêka şerti ve bi tenê şest genêralên talyani ketine destêن ingilizan. Di şerê Elemeynê de genêralê talyani Kermano yê ko miawinê merêşal Graçyanı bû ew ji ketiye hêstriyê. Mêcerê ingilizi Swald yê ko genêral hêşir girtiye çiroka jérin qise kirişti û gotiye:

Xeber gîhaştî bû fermandariyê ko qeragaha piyadeyên talyani ji xetêن me bi tenê bist kilometiran dûr e. Li ser vê yekê fermandariyê emir da firqa me ko rabe hicûmê û ji her du aliyan bi ser girê ko qeragaha talyanan lê bû, bigire. Firqê lez da xwe û qesta pêş kir. Ji ber ko dijmin dikişiya. Dijmin çavê xwe da bû revê. Di qada şer de tang, kemyon û timobilên neyar bê xwedî û xudan li erdê bûn. Dijmin direvi û carina li me diziviri û şerê me dikir; lê şerekî sivik. Em zû gîhastin dora gir û em rabûn êrişê. Talyanan qedîrê du saeten şerê me kir û teslim bûn. 6:00 hêşir ketine desten me. Bi sê genêralên talyani ji em şâ bûn. Lê min ne dizani ko yekî din li hêviya me ye.

Tabûra min hêşir teslim girtin, me dê ew bibirana xetên xwe. Ji milê din mœ kuştiyên dijmin bihejmartana û tiştêن ko li qada şer ma bûn me ew ji bidana hev. Bireki eskeren min talan û yextirme ber hev dikirin. Bireki din ji kuşti dihejmartin.


Eskerekî min ji yên ko kuşti dihejmartin gone min: Eve zabitekti bilindpaye.

Min nîzîngi lê kir û ez lê hûr bûm. Lê min nikart bû ez ritba wi bizanim. Ji ber ko singa wi keti bû bin du cendekên din. Min kir ez cendekan rakim da ko ritba wi bibinim. Ji nişkekê ve qîrinek ji ber lingê min çû. Min pê li milê mîrik kiri bû. Mîrik li ser pişta xwe rabû. Ew genêralek bû. Genêral şejderba xwe siparite min û bi ingilizike şikesti, lê fehimbar gote min: Ez hêşirê te me.

Min lê vegerand û got: Tu birîndar i genêral

Ewi: No, ez ne birîndar im, min bêxe qeslê hêstran

Ne gerek bû ez jê bipirsim ko çire xwe di bin cendekan de veşarti bû. Mexseda wi eşkere bû. Genêral dikir xwe di nav cendekan de veşere û pişti vegera me xwe bigihîne ordiwa xwe. Lê ritbe û lingê min ew eşkere kir. Piştre min zanî ko hêşirê min genêralê talyani Kermano ye.



BOMBAVEJINE EMERIKANI DI HEWSA FABRİKÊ DE LI REX HEV RÉZKIRI



Emêrike ji bo zefera hevalbendan xebateke zor dixebite. Ji bona vê yekê Emêrikê beri ewili hergi fabrike: ê wê ên ticarî hene ew wergerandine ser fabrikeyên hacêtén cengê. Herweki fabrika emêrikani a bi nav û deng ford iro li şûna timobilan tang û balaflaran çêdike. Xelkê Emêrikê ji aliki berê xwe dane ordiwê û ji aliye din bezîne fabrikan û fro tê de ji şerevanyê xwe û ji yên hevalbendan xwe re çekan çédikin.



DI KÜÇEYËN LONDRE DE NÛ Ù KEVIN

Gava mirov di kûçeyén Londrê de digere tiştine neadeti dibine. Lê van tiştên neadeti adet û adet-perestiya ingilizan ne guhartine. Ingiliz weke hergav xwiriniya xwe dikin û pişti nivro di sael pêncan de, çaya xwe, wê çaya bi nav û deng; ya ko jê re çaya snel pêncan dibéjin, vedixwin.

Lê herweki me got di berghê Londrê de gelek tişt guhérine! Beri hertiştî ji ber bombaranen balaşiran gelek kavîl û xirbe di kevin ber çavah.

Iro di vîrûpeli de em ji berhênen kûçeyén Londrê du resiman bêlav dikin.

Herç kîşşa jorîn tişteki zîz û hezin e. Kaloyê li ber erebê yeki çîçekfiroş e. Kalo beriya sih sali dest bi çîçekfiroşiyê kir û mideki direj'ereba xwe di kûçeyén Londrêne re digerand; çîçek'ê xwe disiro'ne û édebara mala xwe dikir. Di sala 1935an de kalo di piyankoyê de, yani yanesib, çend hezar zér kar kirin û pê ji xwe re dikaneke çîçekan şaz kir. Ji hingê ve jiyîna kalo guhêri bû. Kalo bû bû mirovekî dewlemed. Lê vê dewlemen-diye gelektî ne ajot; şerbi ser de hat û di sala 1940i de bom-beyek li dikana wî ket û dikana xerab kir. Kalo vegeriya kûçê û ji hû ve li ber ereba xwe sekini.

Klişâ jérin: Li Londrê bexçekî bi nav û deng heye, jê re Hayd-Park dibéjin. Berê di dora wî bexçê mezin de caşîne hesinî hebûn û xelk di deriyan re diketin e. Pişti şerî ew hesin ji dora bexçê rakirin û ew şandin fabrikan, da ko pê top û tifing û cebirxan çékin. Herweki kîşşe şanî dide, iro dora bexçê herdayî ye û xelk di her derê re dikevin e.



EMÊRÎKANI

DI ROAVÊ EFRÎQAYÊ DE

Xwezûranên [1] me emêrikanî xwe tev didin; tevdaneke xurt. Ji Emêrikê xwe zei kini ne û daketine bakur-roavê Efrîqa, è; gihastine erdê Tûnisê û tê de şerê talvan û elemanan dîkin. Herçî fiensizên wan welatan ji, di bin serfermandariya emîral Darlan de, gihane wan. Ordîwa ingilizan a pêşin ji bi wan re ye.

Romelê ko bi xwe agî è sehreyê bû û qûma sehreyê dişewitand iro ketiye navhera du agîran û dîke bi xwe bisewite Belê ji roavê frensiz, emêrikani û ordîwa ingilizan

pêşin û ji rohele ordîwa ingilizan a heştan bera wi didin û dîkin di Trablîxserbê de bigîn hev.

Evet sefera ha ji bo hemi dînyayê nişkagavike mezîn e. Ji ber ko herkesi digot ko emêrikani piştî ko li Ingîstanê kom bûne ewê dakevin reşâhiya Ewropayê. Ji ber vê yekê ji elemanan perâvên Ewropayê yêñ roavê xurt kiri li bûn.

Vê paşiyê Mr. Çorçîl dîrokiya vê seferê di meclîse de eskere kir. Ji gotara Mr. Çorçîl xuya dîke ko ingiltîz û emêrikaniyan ji mîj ve, ev sefer kar dikirin. Li meha Tirmehî, gava ordîwa Romel gîhaşti bû Elemeynê û dikir berde Iskendîriyê Mr. Çorçîl li Emêrikê li nik Mr. Rûzwelt bû.

Rûzwelt di pêşberê weziyeta Misirê de rabû ji Çorçîl re ev sefer pêşnihad yantî teklîf kir. Rûzwelt dixwest zûka dest bi vê seferê bike û bi vi awayî di qada Misirê de bare ingilizan sivik bike. Lê Çorçîl lê vegerand û got: emî dikarin heta Paszê bîhîna xwe fireh bikin. Ji ber ko Romel ne ketiye Iskendîriyê û nakevî ji.

Li ser vê yekê her du serekân bant pisporênen xwe ên eskerî kirin û mesele ji wan re gotin. Pisporan plan çêkir û li gora wê planê Emêrikê eskerên xwe li Brîtanyê kom kirin û herwekti xwendevanên me dizanîn eskerîn emêrkani li 8e Çiriya-paşîn daktekin erdêن Fas û Cezairê û jê berê xwe dane Tûnisê. Çorçîl vê Havinê gava çû bû Moskoyê Stalin ji li ser vê seferê serwext kir.



Mr. Rûzwelt li Washingtonê ji ber mikrowa Qesira-spi ji dînya û aleme re dide zanîn ko qewetên emêrikani di bin serfermandariya général Eysenhower de daketine bakur-roavê Efrîqayê.

Herwekti me got ingiltîz ji pardariya vê seferê dîkin û di pey emêrikaniyan re ordîwa ingilizan a pêşin ji dakete erdêن Tûnis û Cezairê. Lê serfermandariya van qewetan tev de di destê généralê emêrikani Eysenhower de ye.

Dibéjin ko Eysenhower sermandareki bi vê û quđret û gelekti héja ye. Eysenhower di sala 1915an de ji dibistana herbiyê derketîye û di şerê 1914-1918an de gîhaşte ritba qeymecam (lyotnan kolonel). Eysenhower di vî seri de hevalîtya général Mak Arthr kiriye.

Rûzwelt piştî ko digel Çorçîl gerara vê seferê da, banî Eysenhower kiriye û sefermandariya seferê daye desten wi.

Beri destpêkirina seferê bi heftekê Eysenhower ji Londre çû bû Washingtonê. Rojnaman hingê nivisandi bû ko Eysenhower ji bo şewirine mihibî hatîye Washingtonê. Rojnamevanan ji Rûzwelt pirsî: Gelo sebeba hatîna Eysenhower ci ye?

Rûzwelt li wan vegerand û got: Di wextê şer de ev pîrsiyarî ne bisemt e. Tiştine welê, ji sirêñ eskerî tene hesêb.

Lê piştî heftekê dengê top û tifingan sebeba gün û hatîna Eysenhower eskerî kirin.

[1] Heye ko hin xwendevanên me bibéjin; ma emêrikani ji kengê ve bûne xwezûranên me. Belê ji roja ko axayê me Legzin axa jîn kiriye, emêrikani xwezûranen me ne. Ji ber ko bûka me jîna axê, Floransa diya Ferzo emêrikani ye.


XWEDÊ

TUKESÎ JI DEST

Ü LINGAN NEKIT

Belê; Xwedê tu kesi ji dest û lingan nekit. Ev gotin herweki berê rast û dirist bû; iro ji ewçend rast û dirist e. Lê medeniyetê herwekl dermanênen nexwêşyên heta niho nenas peyda kirine ji kêmlebatiyê re ji tevdîrin dîtine. Li wextê berê gava yek ji lingêki xwe dibû darek didan destê wi an qeyşikek dixistin bin çengê wi û ew bi vi awayî bi ling dikirin.

Lê ito fena nû ji wan mirovên seqet re dest û lingên darin û hesinin çedike û ew mirovên ha gelek caran bi wan labatêni deskut yanî sunhi bi kaiê xwe ê kevin radibûn; di necari, hesinikeri û di sinhetine ji wan ziravîr deji dixebeit, n û weke beiê bi kêri xwe û bi kêri xelkê tê.



Nemaze bi destpêkirina şeri di sinheti lebatêni destikut de tevgereke mezin heye. Şe-revanîyen ko di qadêni şerî de lebateki xwe winda dîkin, piştî ko birinê wan sax dîbin xwe dîkin ber destêni hosteyêñ lebatêni destikut.

Balaflîvaneki ingilizi bi navê Douglas Bedir yê ko 33 balaflîni dijmin aveti bûn erdê di serekî de lingeki xwe winda kiri bû. Jê re lingeki darin çekirine û iro Bedir bi wi lingê destikut bi gokê dileyize û li hespêsiwar dbie

GELO

XWE KUŞT AN HATE KUŞTIN

Gava mifetişê polisê Mr. Blékar gihaştı bû kûça Têsdal hejmar 16 saet bû bû yanzdeh û çarik. Jinikek li wê derê bû. Jinik digiri û digot:

— Xwelli li serê min be; ezê din bibim. Mérê min i reben, min çiqas jê hez dikir, ezê bêt wî ci bikim...

Mifetiş ji polisê nobetdar pirsî: Kanî cendek?

Polis mifetiş bire metbexê. Cendekê mérîk li erdê dirêj kiri bûn. Mifetiş lê hûr bû; bi diqet ew seh kir; lê tiştekî ji adetê der peyda ne kir. Bi tenê beristikê çakêtê wî ji par re spî dikir. Qey lê tozeke spî reşandi bûn.

Mifetiş ji metbexê derket û dest bi istintaqa jinikê kir û got ê: Ma gelo tu sebeb hebû ko mérê te intihar bike, xwe di metbexê de bikuje?



DIAJOYË TANGEKE BRITANÎ DORA XWE TEFTİŞ DIKE

Jinekê got: Ji mêtj ve ye mérê min bâ kar û xebat e...

Mifetiş: Ma ji ber vê yekê li ber xwe diket, acizi şanî dida?

Jinikê: Gelek caran digote min edî bes e, ez nema dikarim. Lê tucaran ne dihate bîra min ko vi işî bike; xwe bikuje. Digel vê hindê Tom, mérê min i reben mirovîkî qels û bê vân û irade bû.

Mifetiş: Li wextê xuri niyê hon pev re bûn?

Jinikê: Belê cenabê mifetiş, me pev re xwar.

Mifetiş: Paşê we ci kir?

Jinikê: Paşê Tom ji min xwest ko ez jê re kiloran çêkim. Gelek ji kiloran hez dikir. Min jê re got, ma ne li ser serê min. Ez çûm sùkê da ko hûr mûran bikirim. Tom li methbexê ma û rojnameyên vê sibehê dixwendim.

Mifetiş: Ü pistre...

Jinikê: Gava ez ji sükê




vegeriyam deriyê metbexê
girtî bû. Min ji derve deng
kire mîrê xwe û got ê
« Çawan te di rojnamê de
tiştek peyda kir, yanî ilana
xebatekê » Mîrê min li min
vegerand û got: « Hêj ni-
zanîm ». Min got ê: « Baş
e, vaporê vêxe ezê niho
bêm » Tom li min vegerand
û got: « Belê ezê vêxim ».
Ez ji nû ve vegeriyam
sûkê, ji ber ko min nivîş
ji bir kiri bû.

Mifetiş: Ü paşê...

Jinikê: Ez vegeriyam mal
û min deng li mîrê xwe
kir. Li min venegerand.
Min zor da derî û ketim metbexê
bibînim, mîrê min xwe dahelandiye ser
tifika gazê [1]. Şirikên gazê vekiri bûn.
Ez bezim û min şirik girtin. Lê iş qedîya
bû. Mîrê min xwe nema tev dida. Min
baz da û ez çûm polsxanê. (polis şanî
dide û dibêje) Ev camêrê ha bi min re
hat û gole min, heta ko mifetiş hê destê
xwe mede tu tişti. Cenabê mifetiş ev e
tifaqa ko li min qewimi.

Mifetiş: Yanî pişî ko mîrê te kete
metbexê û dest bi xwendina rojnaman



EV LOKOMOTİVA İNGLİZİ DIKARE HEZAR TONI BIKİŞİNÉ
Min zor da derî û ketim metbexê Ez ci kir te ew nema dit, ne?

Jinikê: Belê cenabê mifetiş...

Mifetiş: Pişî mirina mîrê te, di met-
bexê de te destê xwe ne daye tu tişti?

Jinikê: No bi tu tişti...

Mifetiş: Ev şûşa wiskiya ko ji nîv
bêtir jê hatiye vexwarin çire li hire, li
ser masa metbexê ye?

Jinikê hinek sekini, da eqilê xwe û
paşê got: İro cejina min e, cejina navê
min e. Me ev cejin şahinet bikira. Bawar
bike mîrê min ev wiskî vexwar, serxwes
ket û vi awayî intihar kir.

Vê care mifetiş hinek se-
kint, da eqilê xwe û paşê gote
jinikê: Mîrê te xwe ne kuştî-
ye. Te ew kuştîye. Te jê re
wiskî da vexwarin û gava mî-
rik bi temâmi serxwes bû û
dilê wi ji bir ve çû te serê
wi da ber tifika gazê û şirikên
gazê. te lê vekirin.

Jinik ker û lal ma, di cihê
xwe da hejîha û mikur hat.
Ewê bi xwe mîrê xwe kuştî bû.

Ma mifetiş çawan ev zanî.
Heke we ew tê dernexist fed-
kirin rûpelê paşin.

[1] Ev gaz bi jehir e û heke mirov
ew bîbir kir û daqurtand pê dimire.




MÊRANI

Ü DRANËN MIROVËN KUŞTİ


Serê giravên Silêman dom dike; nemaze di gira-va Gwadelkenalê de. Gwadelkenal di nav giravên Si-lêman de è mezintir e. Rûyê erdê wê 6100 kilometir çar-göse ye. Ji milê din Gwadelkenal mista giravên Si-lêman tête hesêb. Ji lewie emérikanî bi her awayî zora xwe didin ê; japon ji pê didin erdê û naxwazin giravê ji dest bidin.

Deryavanekî spenyولي ESKERÊN İNGİLİZİ DI BER QRALËXWE: RE DIBORIN bi navê Mendana Gwadelkenal keşif kiri-ye û ewropayı çûn ê. Xelkê giravê polinêz û melêzi ne. Lê bi zemanan ve her du qewim tekili hev bûne û qewi-mekî nû antne pê. Ev qewim ji biyaniyan hez nakin. Xelkê giravê bi çend eşiran leva bidin. Ev eşirêن ha hergav şerê he-vûdin dikan û godtêن hev dixwin. Belê herçî nexweş û peyayêن ko di şeran de




hesir bûne şerjê dikan û dixwin. Lê godtê insanen spi di ser godtê xwe re digirin û roja ko godtê insanen spi bi dest dikeve hevûdin diezimin şiv û taştiyê. Carina ji, ji godtê insanen qelt û pesdirmê çedikin. Seyaheti emérikanî hêt û parsiwên mirovan li ber koxên wan hilawisti ditine. Xelkê ew da bûn ber tavê û ev çeniyên godt hişk dikirin.


Ji milê din xelkê Gwadelke-nalê dranêñ seh û insanen ji didin hev. Bi van dranan jinêñ wan ristik û gerdeniyan çedi-kin û pê xwe dixe-milîn. Di rojêñ cejin û şahinetan de herkes koléksyona dranan bi xwe re digerîne. Herçî ko pê re dran zêde ne ew ji én din mîrtir tête hesêb. Yen ko di koléksyona wi de dran kêm in li cem xelkê kêm-qedir e; ew ne mîrekt qenc e.



JI ORDIWA EMÈRÎKANÎ BALAFIRVANÊN ŞAGIRT



DI TERSANEKE EMERIKANI DE JI SEDAN VAPOREKAN, YEK DAKETİYE BEHİFE



DI VI ŞERİ DE JI BER ERİŞA BALAFIRAN GELEK TIŞTAN LI BIN ERDĒ VEDIŞERİN

GELO

XWE KUŞTİYE AN HATİYE KUŞTIN

« Pişti ko we çiroka rûpelên 16 û
« 17an xwend vê nivîsaré bixwinin

Mifetiş polisê pişti ko
jinik girt û bire polisxanê
polisê pê re jê pîrst:


— Seyda te çawan zanî
ko jinikêmêrê xwe kuştie?

Mifetiş hinek keni û got:
Ne tişteki zehmet e. Te ne
dit li stikurê çakêtê mîrik
tişteki spî dikir. Gava mi-
rov lê qenc dînihêrt didit
ko ew ard e. Ma ard çawan
bi çakêtê mîrik ve bû bû.
Jê xuya dikir ko jinikê
pişti ko dest bi çêkirina
kiloran kiri bû venegeriya
bû sükê. Heke biçîwa sükê
destén xwe dişîstin û sti-
kurê mîrê xwe bi ard spî
ne dikir. Jinikê derew kir
û got; pişti ko mîrê min
kete metbexê min ew ne-
ma dit û di metbexê de
min destén xwe ne da

tu tişti. Çire ev derew kirin. Ji ber ko destén xwe da bû mîrê xwe û ew bi gaza
hewayî kuştı bû. Tu dibint xêra şopa ard me her tiş zanî.

Ji xwe piştre di wextê mihakemê de xuya kir ko jinikê ji yekî din hez |dikir
û ji ber vê yekî herwekt mifetiş polisê téderêxist mîrê xwe kuştı bû.

DI GUNDÊN DORA LONDRE DE



Ji ber bombaranên hewayî hikûmetê gelek tiş ji Londre
rakirine. Û ew guhastine gundên dorê. Di vê navê de
dibistana bijışkan ji hati bû guhastin. Di kîşâ jorîn de
şagirtine wê dibistanê' xuya dikin yên ko di gundekî
de bi cih bûne û tê de dixwinin.

HEJMARA HAWARÊ A 51È LI 15È ÇIRIYA-PAŞİN BELAV BÜYE, LÊ BIGERIN Ü TÊ DE BIXWÎNIN:
Tefsira Qurân, Diwana Melê, Mîr û Nîrçivan, Tiştên danezanan, Selahedîn, Silav li
sifra hazir e, Warê min neî kor e, Şûsa Dilan, Memozîna Xant, Gramêra
kurdmanci, Mezin û Mezinatî, Rewşa Dinyayê.

Kiriyariya Ronahiyê : 500 qirûşen sürü.

Xwedî û gerinendeyê berpîrsîyar : Mîr Celadet Ali Bedir-Xan . Şam—Sûriye
Directeur Propriétaire: Emir Djeladet Aali Bedir-Khan. Damas—Syrie